
Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.


Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (157) Sal 28 20 Tîrmeh 2023 z - 2635 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (100)L.S


# 66 Saliya Damezirandina Yekemîn Partiya Kurdî li Sûriyê


Hemîd Derwîş | Hemze Niwêran | Mihemd Elî Xoce | Osman Sebrî | Reşîd Hemo | Şewket Nesan | Dr.Xelîl Ebdulla

## Desteya sernivîser

Roja 14-ê Hizêrana sala 1957-an, li mala xebatkarê Kurd Mihemed E›lî Xoce li bajarê Helebê, 7 têkoşerên Kurdperwer (Osman Sebrî, Reşîd Hemo, Mihemed E›lî Xoce, Şewket Ne›san, Hemîd Derwîş, Hemze Niwêran û Dr. Xelîl Mihemed) civînek lidar xistin û biryar bi damezirandina partiyeke Kurdî li Sûriyê wergirtin, û birêz Reşîd Hemo weke Sekreterê Partiyê binav kirin, û ji xwe Apo Osman weke serkêş û mezinê partiyê bû. Pistî çend heyvan, di sala 1958-an de, Dr.Nûredîn Zaza û Cegerxwîn (Mele Şêxmûs) û Şêx Mihemed Îsa tevlî serkirdayetiya partiyê bûn, û Dr. Nûredîn Zaza weke serok hate binavkirin.

Di siha merc û hoyên bikaranîna siyasetên nijadperest dijî gelê Kurd li Sûriyê û hewldanên windakirin û pişaftina wî ji bal destelata Sûriyê ya şoven ve, gelê me jidayikbûna Partiyê bi dilxweşî û mîna mizgîniyeke pîroz pêşwazî kiriye û bi dilgermî hembêz kiriye.

Lê, destelata şoven, bi hemû awa û karînên xwe şerê vê partiyê kiriye û serkirdayetiya wê avêtiye binê zindanê, rê û derfet li pêş firehbûna rêzên wê di nav gel de girtine. Lê, digel ewqas fişar û zordestî jî, gelê Kurd û partiya xwe berxwedan kirine, kiryarên rijêmê rûreş û riswa kirine û bi serfirazî berevanî di ber doza xwe ya dadmend de kirine. Di vî warî de, belgeya Dr. Nûredîn Zaza ku li hember Dadgeha Ewlehiya Dewletê pêşkêş kiriye, nîşana têkoşîn û cihê serbilndî û .....

2

# Roja Zimanê Kurdî Rojeke Pîroz e

Roja 15-ê Gulana sala 1932-yan, yekemîn car di dîroka gelê Kurd de, Mîr Celadet Alî Bedir-Xan kovareke bi bi zimanê Kurdî bi navê HAWAR û bi tîpên Kurdî latînî li Şamê weşandiye, bi sedan xwendevan û rewşenbîrên Kurd tê de nivîsandine, helbest, gotar, dîrok, wêje, çêrok … hwd belav kirine, bi hezaran xwendevanên Kurdiya latînî çêbûne, kovara xwe hembêz kirine û bendewarê derçûna wê bûne. Paşê, mîrê gewre 28 hejmar ji kovara RONAHÎ jî weşandine, dilê gel bi wan xweş kiriye. 57 hejmar ji kovara HAWARê derketine û rawestiya ye.

Ji ber rola Kovara HAWARê ya berbiçav di geşkirina çand û toreya Kurdî de, roja 15-ê Gulanê bûye Cejna Zimanê Kurdî. ji ber .....

3

# Jina Kurd « Yeşîlguz » Berbijêra Serokwezîriya Holenda ye



## Newroz

Li gora nerîna nûçevan û şopînerên siyasî, Dîlan Yeşîlguz ku jineke Kurd a devera Dêrsimê, endama Partiya Gel Ji bo Azadî û Demokrasiyê- VVD- ye û di hikûmeta çûyî de Şalyara Dadê bû. Û ji ber çalakî û zîrekiya wê, di nav 5 berbijêrên Postê Serokwezîrtiya Holendayê de, ew ya herî xwedî şens e!

# Riya jiyanê yan ya mirinê ye ?!

**Nazdar Hesen**

Belê koçberkirin riya jiyanê yan ya mirinê ye? Riya peydakirina jiyanek baştir an binpêkirina jiyanê ye? Riya şahiyê û hêviyan an bidawîbûna şahî û hêviyan?

Ji ber ku koçberkirin bi riyên qaçax û bi destên qaçaxjiyan dibin çarenûsa yên koçber dibin ne diyar e, koçber di rê de rastî pir zehmetî û metirsiyan tê, dibe ku yek ji sedî bi hêsanî derbas bibe lê ji sedî nod û neh bi çavên xwe mirinê dibînin an bi rastî jî dimirin an pere û cefayê deh salan tên xwarin. Ji ber vê yekê jî em dikarin bibêjin riya koçberkirinê mîna lîstika kabê ye dibe ku tu bi ser kevî an bi bin kevî, tenê cudahiya di navbera herduyan de, di lîstika kabê de, zirar pere ne lê, di riya koçberkirinê de, qelen can û pere ne. Bêguman çûyîna peran ne wek jidestdana can e; pere derin û tên, lê qet çareserî ji vegera can re tune ye! . Erê rast e ceng , lêgerîna karekî û jiyanek baştir û ji felaketên xwezayî wek nexweşî, erdhej (zerzel), volkan û birçîbûn, pirsgirêkên rewşenbîrî û siyasî bi dûr kevin û jê werin rizgarkirin, sedemên herî sereke ne ji koçberiyê re, û yê ku dihêle mirov bighêje asta ku çarenûsa xwe di navbera mirinê û koçberiyê de bibînin, lê zor mixabin pir caran koçberî jî dibe sedema mirina wan .

Belavbûna diyardeya koçberiyê û zêdebûna qurbaniyan? Kî di ber de berpirsiyar e? Ceng e an tunebûna aştî û ewlehiyê ye, riyên qaçax, û qaçaxî jî yan deriya yan jî lawir in; biryar çewt e gava yek koçber bibe? Ên din jî bi dû din nizam, lê em dikarin bibêjin ev hemû ji ber ve berpirsiyar in, û ta rewş wiha bimîne û pirsgirêk neyên çareserkirin wê pir keç, xort û şêrînên me yên dest henekirî, di deriyan û çeman de, binav û noq bibin û pir kezeb û ceger wê bişewitin.

## Li Bonê Xwendekar hatin xelatkirin



Bi beşdariya dora 100 kesî, li bajarê BONê ya Almanya, roja 09.07.2023-an, bi hebûna hin mêvanan (Şivan Perwer, Dr.Husên Hebeş, Dr.Azad Elî, Dr. Mihemed Zeyno, Helbestvan Husên Hebeş û ragihênder Arif Jabo), ahengeke lidar ket, têde 32 xwendekar hatin xelatkirin. Hêjayî gotinê ye ku Koma Zozan jî di ahengê hin dîlanên folklorî pêkêş kirin.

**66 saliya... Dûmahîk**

rêzgirtinê ye.

Lê mixabin, bi demê re, neyarên hebûna gel karîbûn vê tevgerê ji hundir ve bi giranî birîndar bikin, rêzên wê ji hev bixin û wê parçe bikin!.. Ew parçebûna ku bûye egera qelsbûn û peydabûna valahiyekê di navbera wê û cemawer de, û ta roja îro, agirê parçebûnê ji hev dizê, û dilê gel dişewitîne.

Neyarên doza Kurd baş dizanin ku tu gel, bê rêkxistin û tevger nagihêjin armancên xwe û biser nakevin. Ji ber vê hindê, ew hewl didin ku tevgera siyasî ya Kurdî ji holê rakin, tune bikin, di civakê de wê kêm û bê rol bikin da ku gel jê dûr bêxin, û ew bi qîma dilê xwe pilanên tunekirina wî, ziman, folklor û sextekirina dîroka wî bi hêsanî birêve bibin.

Bêgoman e ku di pilan, dek û dolabên xwe de ta radeyekê ew biser ketine, rêzên me ji hev cuda û belav kirine, dîwar di navbera me biran de, xwediyên yek doz û armancê, ava kirine, tevgera me kulek û bê hêz kirine. Li hêleke din, ev pirbûna bêsînor a partiyên Kurdî û Kurdistanî(!) ku di dema dawî de hatine çêkirin, hêviyên gelê me dişkîne, û baweriya wî bi tevgera wî qels dike, me xwestî nexwestî, bi pilanên neyaran re alîkariyê dike.

Di vê bîranînê de, pêwist e em Kurd serûber li xwe vegerin, rewşê weke heyî bibînin, bixwînin û binirxînin, ji bo parastina berjewendiyên gel û welatê xwe Sûriyê tevbigerin, dev ji durişmên mezin berdin û gelê xwe bi xweşgotinan nexapînin û berî her tiştî, bila biryara me ji serê me be, tu alî destêwerdanê di siyaseta me de nekin, çiku ew karê me Kurdên Sûriyê bi xwe ye, û bê derengî tê xwestin ku civînek ji partiyên sereke re lidar bikeve, di wê civînê de, pilaneke karê hevbeş destnîşan bibe, nûnertiyeke Kurdî Sûrî di rêya kongreyekî giştî re bi beşdariya welatparêzên serbixwe saz bibe, hemû bi hev re, mil li mil, pişta xwe bidin hev û berê xwe bidin neyarên hebûna gelê xwe û bi dilsozî xebatê bikin. Eger ev gav neyê avêtin, bila em zanibin ku gotin û kiryarên me ji hev dûr in, û ew dûrbûna di navbera me û gelê me de heye, her kûrtir û firehtir dibe.

Silav ji giyanê xebatkarên gelê me re, silav ji her Kurdekî ji hundir û derveyî rêzên tevgera siyasî re ku ji dil û can, bi dilsozî kar û xebatê dike, û ji bo vê armanca pîroz her em li rê ne.

Digel vê rewşa me ya ne xweş û tevlîhev, em bê hêvî nabin, û em bawer in ku man û serkeftin ji gelê me re ye.

**Roja Zimanê... Dûmahîk**
giringiya zimên di jiyana gelan de, nemaze ya gelê me yê Kurd ê bindest, ku ta roja îro zimanê wî lê qedexe ye, di vê hejmara NEWROZê de, me giranî daye gotarên ser zimanê Kurdî. Li jêr ji xwendevanên xwe yên birêz re, em çend gotarên ser zimên pêşkêş dikin û Roja Zimanê Kurdî li we pîroz be!

====

Di 11-ê Hizêrana (Pûşbera) sala 2635K de, li ser daxwaza Komîteya çand û ragihandinê ya rêxistina Kurdistanê ya Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, endama Saziya Fêrkrin û Parastina Zimanê Kurdî, Şaxê Ewropa mamoste Gulistan Awaz semînarek bi navnîşana «Zimanê Kurdî di navbera welêt û biyaniyê de» li Hewlêrê pêşkêş kir.

Li jêr, em deqê wê gotarê bi tevayî ji xwênerên NEWROZê re diweşînin:

## Zimanê Kurdî di Navbera Welêt û Biyaniyê de



**Gulistan Awaz**

### 1- Zimanê Kurdî

Zimanê Kurdî zimanê




miletê Kurd e, ji malbata Hindo-Uripî ye û bi zaravayên xwe dewlemend e, wek: Kurmancî, Soranî, Zazakî û helbet pir zaravayên din jî hene. Ne tenê ev e, eger em guhdarî dengkirina şêniyên ku li deverên cûrbecûr dijîn wek çiya, deşt û li beravan bikin, emê bigihin wê encamê ku li her deverekê diyalêkteke xwe ye taybet heye; ev jî dewlemendiyeke zimanî ye. Ji bilî zaravayên zimanê Kurdî, hevwateyên bêje û peyvan bejina zimanê Kurdî bihêztir kirine, wek: Eger ez bixwezim çelengiya keçikekê diyar bikim, ez dikarim pir peyvan bikar bînim, mîna: Ev keç çendî xweşik e, çeleng e, rind e, lihevhatî ye... û HWD

### 2- Rola rojnamegeriyê û nivîskarên Kurd di fêrkirin û parastina zimên de

Ji destpêkirina derçûn û belavbûna berhemên Kurdî û bicihbûna wan berheman di nava malên Kurdan de, ew gaveke berçav û tekezkirî bû ku pê re karîbû rola xwe di hişiyarkirina Kurdan de bilîsta da ku hem li zimanê xwe xwedî derkevin, hem jî xwe hînî zimanê xwe ye şêrîn bikin. Wek mînak eger em bala xwe bidinê, di dema derçûn û belavbûna kovara HAWARê, sala 1932yan de, li ser destê Mîr Celadet Bedir-Xan, tevî rewşa ne baş, zor û zehmetiya çapkirin û belavkirina vê kovarê, û bi saya wê, bi hezaran kes hînî elfebê û nivîsandina Kurdî bûn.

Min pir caran ji derdora xwe dibihîst, dema ez dipirsim we çawa xwe hînî zimanê Kurdî kiriye, dibêjin ku filan pirtûka Kurdî ketibû nav destên me, û me xwe ji wê hînî elfebêya Kurdî kir, wek pirtûka elfebêya nemir Osman Sebrî.

### 3- Zimanê Kurdî li welêt

Ziman stûna hebûna netewan e, eger ziman nema helbet netewa wî zimanî jî namîne; lê eger ziman azad û ne bindest be, û netewa wî xwedî lê derkevin, hîn bibin û zarokên xwe hîn bikin, êdî metirsîna windabûna wî zimanî namîne; lê eger bindest û ne azad be, fêrkirin û axaftina bi wî zimanî qedexe be, êdî ew ziman di metirsiyê de ye, mîna zimanê Kurdî. Ji salên dûr û dirêj ve, dijminên vî zimanî hewlên tunebûn û helandina wî didin, û hîn jî didin. Lêbelê, bi saya zimanperwer û Kurdîhezan, hetanî roja îro zimanê Kurdî xwe parastiye, û bi taybetî li dever û gundên Kurdan. Li wan deveran û çendî xaka Kurdistanê bindest be jî, mirov dikare zimanê Kurdî yê standard û yekteşe li wan deran bibîne. Kal û pîrên Kurdan ji bilî Kurdî bi tu zimanên din napeyivin, zarokên xwe hînî zimanê dayîk kirine û pê re jî dijîn.

Eger em li welêt berve bajaran dakevin, li wir bejna zimên dikeve metirsiyê û zimanên serdestan zorê didin ser zimanê Kurdî. Mixabin ku hin malbatan girîngî dan fêrbûna zimanê serdestan, herwisa jî zimanê dayîk di hundir malan de hêdî hêdî jibîr dibe. Ku em berê xwe bidin Sûriyê, hetanî berî sala 2010an, axaftina bi Kurdî li derveyî malê, li dibistanan û li cihên kar qedexe bû. Tevî wê rewşa zor jî, tu caran Kurdîparêz bê hêvî nebûbûn û bi hemû hêzên xwe liberxwe didan. Di riya kovar, rojname û pirtûkên Kurdî yên bi dizî diketin nav destên wan, xwe hînî elfebê, nivîsandin û xwendinê kirin.

### 4- Rola saziyan

Li sala .....

4

**Roja Zimanê... Dûmahîk**

2006an, yekem sazî ji bo hînkirinê, bi navê Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê, hate damezirandin. Helbet bi piştgiriya partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê bû. Xebata vê saziyê hetanî roja îro didome. Li Helebê, Şamê, Qamişlo û Kobaniyê, li her gund û deverên Kurdî, ziman hate fêrkirin.

Bi dizî bû, belê! Lê tevî wê jî, bi hezaran keç, xort, biçûk û mezinan fêr bûn, û hin ji wan şagirt û xwendekaran bûne mamoste, nivîskar û rewşenbîr. Wek: Vejîna Kurd, Giryan Seyro, ji bilî wan jî pir hene.

**5- Avakirina malên zimên û berdewamiya fêrkirinê ta roja îro**

Piştî sala 2013, fêrkirina zimên li deverên Kurdan, tevî razîbûn û hin nerazîbûnan jî, derbasî dibistanan bû. Her xebat bi xwe erênî û neyîniyên wê hene, tevî vê yekê mirov nikare paşguh bike ku yekem car e zimanê Kurdî serkeftineke dîrokî bi dest xwe xistiye, û ta îro roj jî li dibistan, amojgeh û zanîngehan tê fêrkirin.

**6- Zimanê Kurdî li biyaniyê**

Ji zû de zimanê Kurdî derbasî axa biyaniyê bûye, ew jî ji ber sedemên cûrbecûr ku şaxên wê li derveyî welêt belav bûbûn.

- Ji ber bicihbûna Kurdan bi sedemên têvel li biyaniyê û bidestxistina azadiya ku li ser axa welêt jê bêpar mabûn.

- Ji ber sirgûnkirina zimanzan û rewşenbîrên Kurdan mîna (malbata Bedirxaniyan)

Mîr Miqdad Midhet Bedirxan, lawê Mîr Bedirxan, mîrê Cizîra Botan, û bi sedema nexweşiyê, di sala1897an de, ji Istenbolê berê xwe dide Misrê û li paytexta wê bicih dibe.

Mîr Miqdad ji bo tekezkirina zimên û rewşa gelê Kurd, dibîne ku gava pêşîn ji bo pêşketin û azadiya wî belavkirina zanînê ye. Lewra jî, di 22yê Nîsana sala 1898an de, wî hejmara yekem ji rojnameya «KURDİSTAN» bi zimanê Kurdî û tîpên Erebî (Osmanî) li Qahîrayê, weşandiye.

Di dîroka gelê Kurd a nûjen de, “KURDİSTAN” yekemîn rojname bi zimanê Kurdî bû. Piştî hejmara pêncan, li 16ê Hizêrana 1898an, weşandina rojnamê radiwestîne û vedigere Istenbolê. Pişt re birayê wî mîr Ebdurehman, barê berdewamiya belavkirina rojnameyê hildigre, û li derveyî dewleta Osmanî, çend mehan li Ewropayê, çi Siwîsrayê û çi li Brîtaniyayê, 26 hejmarên din diweşîne.

Rojnameya «KURDİSTAN» digihîne hejmara 31ê, ew hejmar li Cinêfê têye çapkirin û li wir radiweste. Lê ew dibe çirûskek ku li pey wê bi sedan navên rojname û kovarên Kurdî derketine holê.

**7- Fêrkirina zimanê Kurdî li dibistanên fermî li biyaniyê**

Ji sala 1977an ve, zimanê Kurdî bi fermî li Swêdê tê fêrkirin. Ne tenê li bajaran, lê li her cihekî ku çend zarokên Kurd li dibistanekê hebin, êdî berpirsên dibistanê daxweza mamosteyan dikin.

-Ji sala 1993-1994 ve, li eyaleta Bremen ya Almanyayê, û bi saya xebata Dr. Zeredeşt Haco, destûra fêrkirinê li dibistanên fermî wergirt; û ji wê demê û ta roja îro, mamoste Emîn Ekbas bê rawestan zimanê Kurdî li dibistanan fêr dike. Helbet hin mamosteyên din jî hene û ta vê demê fêrkirin derbasî çend eyaletên din jî bûye.

-Li hin zanîngeh, komel û navendan li Almanyayê, beşê fêrkirina zimanê Kurdî hatiye damezirandin.

-Li sala 1993yan, komela Yekmal li Berlinê - Almanya - hate damezirandin, xebateke zor hêja hetanî roja îro birêve dibe, û fêrkirina zimanê Kurdî di hin baxçeyên zarokan de, wek baxçeyên duzimanî (Almanî-Kurdî) binav dibin ku zarok tê de bi van herdu zimanan fêr dibin.

Şaxên YEKMALê li hin bajarên din jî hene û li Avdara îsal, 2023yan, derbasî eyaleta Bremenê jî bû û bûroya xwe vekir.

-Di sala 2019an de, şaxek ji SFPZK li Almanyayê hate damezirandin û kursên fêrkirinê li serhêlê/onlin û li hin komeleyan tê fêrkirin.

-Li sala 2019an, Komela Civaka Kurdî ji bo Hînkarî û Perwerdeyê li eyaleta Bremen - Almanya hate damezirandin, serokê wê Dr. Zeredeşt Haco ye û ez cîgirserok im. Xebata wê ya sereke ji bo hişyarkirina dê û bavên Kurd e, da ku li zimanê Kurdî xwedî derkevin, û hezkirina zimên di dilê zarokên xwe de biçînin, û zarokên Kurd daxwaza fêrkirinê li dibistanên fermî bikin.

-Li hin welatên din jî Kurdî tê fêrkirin, wek Rûsiya, Ferensa û Caponê ku beşek ji fêrkirinê li zanîngehê vekirine

**8- Pirsgirêkên fêrkirinê**

Hînkirin li dibistanan mîna li Swêdê, ku çar zarok tenê li dibistanekê hebin, waneyên Kurdî tên dayîn. Li beramberî wê, li Almanyayê, hejmareke destnîşankirî heye, yanê li her dibistanekê eger hejmara şagirtên ku daxweza zimanê Kurdî dikin kêmtirî 14-16 bin, mixabin wê hîngê Kurdî danakeve rêbaza xwendinê. Ji ber vê yekê xebata komala Hînkarî Bremen a sereke ew e, ku bi dê û bavên Kurd re bicive û wan hişiyar bike.

# Veger Derman e

**Zanistê cûmê**

Apê Misto xwediyê heyşt zarokan bû, piştî temenê wî digihe 65 salan ew û hevjîna xwe, xaltiya Gulê wek sêwiyan li gund jiyana xwe berdewam dikin.

Apê Misto pir xem û qisaweta xwe nedixwar, ji ber ku çê xirap bi lingên xwe derdiket derve, derd û kulên xwe derman dikirin. Lê, xema hevjîna wî bûbû qisawetek mezin ji ber nexwaşiyê û geres (gerek) heftê du caran bibe bajarê Efrînê ji bo ku gurçikan jê re bişon, çûn û hatina ji Efrînê bi zehmet û rezîliqî bû, tunebûna makînan û mandina hewşa gund bê kes astenkek pir mezin bû, ji ber ku dema ji nexweşxanê vedigeriyan mal, biçûk û mezinên ew kesên dûv dirêj ku li gund bi destê dagîrkeriya dewleta Turkiyê hatine bicihkirin hewşa malê tar û mar kirine.

Dema li ser xwe bû, Efrîn jî li ser xwe û rû geş bû. Di hersê cejnan de, zarok û neviyên wî di hewşa malê de duxulxulîn, û bi taybet dema ji wê de dihantin qirikên zarok û neviyan yek bi yek bîndikir, û piştre maç ji neviyên xwe dibirin ji ber ku piraniya zarokên apê Misto li bajaran dixebitîn û kar dikirin.

Hin caran dema dixwast xem û xeyalên xwe ji bîr bike, berê xwe dida deştê pişta xwe dida koka dara zeytûnê, li bin siya darê rûdinişt û hin caran di xew ve diçû. Dema şiyar dibû di nêrîn û ramanên xwe de dûr diçû; ev xişim û bêtara ku hatiye serê çiyayê Kurmênc, û ev gilgemara bajarên sûriyê tev li Efrîn û gundewarên wê hatine belakirin! Ma kî sebeb e? Û kê we kir? Hîn bi ser xwe de mijûl e! Ji nişka ve, biraziya wî deng lê kir. Tu li ku derê bûyî, me tu windakirî. Amojina Gul rakirin nexweşxanê, gava diçûn ew û cendekê Gulê bi hev re digînin gund. Apê Misto bi dilekî şewitî bandike û dike qêrîn. Mala min careke din hate hilweşandin û xirakirin, cara yekê dema ev kesên dûvdirêj û toximperest pêl axa çiyayê Kurmênc a pîroz kirine, û cara diwem va hevjîna min çû ber dilovaniya Xwedê û nema vedigere.

Dema ji ser tirban vedigerin mal, ew berxê tawlî ku kirî bû, ku apê Misto xwedî dikir, da ku roja zarok û neviyên wî vegerin serjêbike, hatibû dizîn!

Sê rojik û çile jî derbasdibin, derd û kulên apê Misto mezintir dibin, zarok û neviyên wî dûrtir dibin, mîna kundê di şevên tarî de, bi tena xwe dimîne. Bihên teng dibe, li kera xwe siwar dibû û dadiket deştê, li bin dara zeytûnê pal vedida. Bi dara zeytûnê re dikeve guftûgoyê û jê dipirse: Xuya ye tu jî wek




min sêwî û bê xwedî mayî, pelên te zer bûne, koka te qaliq bi diranan di ser re hatî rêşkirin, ta şiqnên nêr (bendûq) hatine xwarin. Lê hema ya baş damarên te hîn di bin axê de ne, ger xwediyê te vegerin û tu werî avdan, dîsa û ji nû ve tê geş bibî!

**Lê ya herî girîng zeytûna min î delal û buha, dixwazim ji te bipirsim?**

Ev rewşa min û te û zordariya li me tê kirin, berî bi kû de ye? Her yek ji me dimire malek wêran dibe, ji ber ku piraniya malên mane ji du-sê kesan in, çend salî din wê yekî dûvdirêj li şûn min û te rûne. Ya ji wê girîntir û pêwîstir ev Kurdên me yên li navça ( şehba), çima venagerin! Li benda kê û çi mane!. Gava xwe top hev bikin bi alên sipî û bi meş, bi silogan û durişmên aşîtî, wekhevî û şiqnên darên zeytûnê bilind rakin û berên xwe bidin Efrînê, da ku ez û tu sêwî nemînin, wê ne baştir be! Bawer nakim ew xelkê me li wir bi hesanî yan bi tiving û şer vegerin ser xaka xwe. Hemû welat wek gokê bi me dilîzin, û berjewandiya wan di ser mafê mirov û gelan re ye. Vêca çima em berjewandiya xwe nas nakin û naşopînin! Em dibin koleyên berjiwandiya wan mîna kerên ji qantira re kar dikin!

## Heval Azad Cangîr ji nav me bar kir



Roja Duşemê 12.06.2023, li bajarê Qamişlo, ji nişka ve dilê heval Azad Cangîr rawestiya û koça dawî kir. Hevalê me Azad Cangîr bi comerdî, dilsozî û mirovahiya xwe naskirî bû. Her destê wî ji bo alîkariyê bi belengazan re vekirî bû. Bêdudilî, ew bi erkên xwe yên civakî û welatparêzî radibû.

Cihê wî bihuşta rengîn be, serê malbat, dost, heval û hezkiriyên wî sax be!

# Azadî Zanava Min e

**Kalê Maratê**

**Bi hest û ramanên gava pêşîn .**

Her destpêkek bi hest û ramanên di asta evînê de dema xwe li peravên dilê mirovan dide, di giyanên mirovan de teqînên volkanîk çê dike, li gor canê wê dem û kêliyê riyên nû peyda dibin û peywirên nû li pêş mirov derdikevin.

Di berbanga avarek welatê min de pêkanîna karkeriya demê pîroziyan li giyanê min ê neteweyî bar dike, hema destên min bigihin ku dixwazim li wir kulîlkan biçînim di binê her lat û zinarekî de di ber û singê her dar û warekî de hema berê min bi kîjan aliyê welêt bikeve bi tîna agirê Newrozê divê ez hemû qirêjiyan bişewitînim û wê xuliya ji ber mayî li wê axa pîroz bireşînim û ji wê axa şewitî bi baweriyeke têrpaqij ji nû ve jiyaneke azad bafirînim ramanên ku ji vê baweriyê re pêşengiyê dikin, ji agirdanên zerdeştiyê ye û tîna xwe şikandine di rojeke ku rûqalî(beramberî) çarê nîsanê dibe de, dixwazim di wê evîna nûranî de hestên xwe bihewînim .

**Xwedî armancên mezin**

Hestên min ên giranbiha hene ku bi vegotina çand û zimanê min ê dayikê hatibûn meyandin, ji bo li her serdemekê em wateyeke zêrîn lê bar bikin. Hema bibêje dîwar bi neynûkan li dijî her cureyên hovitiyên serdestan hatine kolandin, û girêdana bi kokên xwe ve pir bi wate bû. Zarokên welatê min kêlî bi kêlî berxwedan bi jiyana exlaqî û polîtîkê hunandin di navbera dîroka kevnar de hatin kolandin roja me navê bindestan bi tîpên zêrîn hatin neqişandin ew dergûşa mirovahiyê ya ku di pêsîrên vê axê de hat mijandin divê bi tu awayî dagirkeriyê li ser vê axê nepejirîne xwediyê serpêhatî û armancên mezin im, bi dehan bi tofanan re rû bi rû bimînim jî, bi sedan di komkujiyan re derbas bibim jî ji nû ve xwe ji axa bermayî de peyda dikim. Ez heyva nû ya zêrîn im wekî her carê dîsa jî strana li ser ziman im axa bi xêr û bereket xwedî gelek berhemên dayika xwedawend im.

Îro evîndarê baweriya jiyana azad a bi hev re û dilsozê ramanên neteweya demokrat im. Xwedî reng im bi nav û deng im, ji roja ku roj ji lûtkeyên çiyayan bilind dibe, ez qêrîneke xwedî hezar awaz û deng im .

**Encama bêhempa**

Dengê min olan dide li qadên welêt bi dengê ku ji dûr ve tê govenda azadiyê tê gerandin keserên dil yek bi yek tên revandin êdî şabûn diyardê ye di kenê li ser lêvên zuhayî veşartî de her demsal bihra e di Paxila min de veşartî stêrk di porê yarê de neqişandî kezî bi kezî hûnandiye sebria min ji çavên li rê mayî re mizgînî ye.

Roja min gulrengdar e, û bi hezaran xwedî armanc û bi biryar im . Azadî zanava min e, ku ji serhildana Newrozê çêdibe tîrêja di taritiyê de dibiriqê ye.

Heta ku ew zanav hatiye bi destxistin bi hezaran canan di oxira wê de can dan, kirin baxê bilbil û şeyda weha rengîne. Kurdistan kirin deryaya evîn û sewdayê, bûne dermanê hemû kul û derdan û wiha qîriyan li her çar dor û Milan:

Encam dê bêhempa be mizgîniyê bidin Roja me.

## Li Almanya Reşîd Bakîr û Fatima Hemadê Hatin xelatkirin

Li ser pêşniyara hevalên li vir, Komîteya Herêma Başr – Rojavayê Almanya biryar da ku herdu heval: **Reşîd Bakîr û Fatima Hemadê** werin rêzdarkirin, li ser dîroka têkoşîna wan a bi rûmet a di doza gelê me yê Kurd li Sûriyê de.

li vir bi kurtasî vê dîrokê em bibîr bînin.



**Heval Reşîd Bakîr lawê Hesen û Elîfê**

1- Di 5/9/1954 de, li gundê Qudeh - navçeya Reco - herêma Çiyayê Kurmênc (Efrîn) ji dayîk bûye.

2- Xwendina dibistana seretayî bidawî kiriye, li dibistanên gundê xwe Qude, Me`imila û Reco ji sala 1960 ta 1966-an. Bawernameya amadeyî ji dibistana Ibn Ruşd li Efrînê sala 1969 wergirtiye. Di wê demê de tevli partiya Komonîst a Surî bû. Piştre li Helebê xwendina xwe berdewam kir; partiya Komonîst berda, sala 1970 kete Partiya Demuqrata Kurd li Sûriyê (ELPARTÎ). Paşê Peymangeha pîşesaziyê li Helebê sala 1974 PZ bi dawî kir.

3- Ew yekser, piştî qedandina xwendina xwe, bû mamoetê Pêşesaziyê li dibistanên pîşesazîyê li bajarê Helebê.

4- Di sala 1980 de, bi heval Fatime .....

7

**Li Almanya... Dûmahîk**

Hemadê re zewice, keçeke wan bi navê Bêrîvan heye, ew jî zewicî ye û di maleke nêzî dê û bavê xwe de dijî, 4 zarokên wê yên gulber hene xwedê wan tavan biparêze.

5- Heval Reşît ji 1970yî ve karê xwe di rêxistinên Helebê de kirye û di komik, Komîtên Şax û Herêman ên partiya Yekîtî de jî, dixebite tevî berdewamiya astengên tendirustî û civakû.

6- Bi comerdî û bê sînor xebata xwe kir. Li gel buveyan an xeteriyê, vî hevalî mala xwe vekir bi dilfirehî, û mala wan ne tenê mala hevalan bû, ji bo partiyê jî bû. Weşanên wê û hevdîtinên lîderan, karê wan ên veşartî di şert û mercên herî tarî de bê westandin bû, bêygazin, bêyî ku li benda spasiyê an xelatekê bin.

7- Di sala 1997›an de koçî Almanyayê kir û bi hevalên xwe yên li Ewropayê re têkoşîna xwe berdewam kir, heya ku ji ber şert û mercên taybet û nexweşiyan, rawestiya ji karê rêxistnê. 43 sal di nava refên tevgerê de ma weke şervanekî bêdeng ku pir dikir û kêm daxivî.

8- Kesayetiya heval Bavê Berê ew e, bi aramî, dilsozî û bi qasî ku ji destê wî dihat, bicihanîna erk û wezîfeyan dihate naskirin. Em bi serbilindî Bavê Bêrî wek hevalekî fedayî, wek modela bi sedan, bi hezaran milîtanên gelê me yê Kurd dinasin, ku



piraniya jiyana xwe derbas kirine bi bedelên bi rûmet di parastina hebûn û mafên Kurdan de.

**Heval Fatime Hemade keça Îbrahîm û Fîdanê**

1- Di sala 1961›an de li bajarê Helebê ji dayik bûye.

2- Di pênc saliya xwe de çûye pêşdibîstana Ermeniyan û dibistana seretayî li dibistana Kordoba li Eşrefiyê di sala 1966an de xwendiye; piştre xwendina xwe berdewam kir li Senewiya Ednan El-Malikî. Di sala 1980 de bekelorya stand bi heval Reşît re zewicî, piştre heta sala sêyemîn li Fakulteya Zanyarî li zanîngeha Helebê xwend û di sala 1984an de ji ber çûyîna mêrê wê leşkeriyê 4 salan dest ji xwendinê berda ji ber şert û mercên civakî gelek dijwar bûn.

3- Hevala me Diya Bêrî li taxa kevn a El-Suryan a Helebê di nava malbateke Kurd e welatparêz ji gundê Qitmê Herêma çiyayê Kurmênc - Efrîn de mezin bû û di nava xebat û têkoşînê de xwe dît, di sala 1973yan de çend lîderên ku ji aliyê îstixbaratê ve hatin binşopankirin. Di yek ji du odeyên mala xwe de demek dirêj xwe veşartin, demeke dirêj xizmeta wan hate kirin. Di wê demê de asayîşê têkoşer Emîn Şêx Gulîn û hin din ji serkirdayetiya Partiyê girtin û paşê jî bi dehan salan mêvandariya hevalên partiya me û serokatiya wê kirin.

4- Ew di sala 1978 an de tevlî Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (El-Partî) bû. Ew yek ji pêşemîn endamên damezrêner ên rêxistina jinan e. Di tevgera Kurdî de li Helebê (li gel Fatima Mihemed, Asiye Brîmcah, Emina Brimo û Diya Kawa ji Cezîrê). Di rêxistinên Helebê a Partiya me (Yekîtî) de endamtiya komik, Şax, û Herêmê kiriye. Di hilbijartinên fermî yên Sûriyê de namzeda tevgera Kurdî bû. Hêjayî gotinê ye ku bi salan li Ewropayê çalakiyên xwe yên siyasî û civakî berdewam kir.

5- Em dikarin bibêjin ku Hevala Fatima gelekî di bin bandora welatparêziya dê û bavê xwe de maye û li hemberî nexweşiyan, di şert û mercên zehmet de bi serhişkiyeke bêhempa li ber xwe da. Hemû hevalên wê dizanin, wê weke jineke Kurd a wêrek, xebata xwe siyasî û civakî domand.

6- Ew di kampanyaya xwe ya hilbijartinê de ji kombûnên girseyî cemawerî re axivî û bernameya xwe ya hilbijartinê pêşkêşî wan kir wekî berendam ji bo hilbijartinên rêveberiyên herêmî li herêma Efrînê û bi wêrekî rûbirûyê desthilatdaran û zextên wan bû.

**Serkeftin ji doza kurdan re!**

**Spas ji Herdu Hevalan re Reşît – Fatme**

*roja Yekşemê 30.04.2023an*

**Komîteya Herêma Başûr – Rojavayê Almanya**

## Divê Demîrtaş û Yuksekdag serbest werin berdan




Dadgeha Bilind a Mafên Mirovan a Ewropî bang li Tirkiyê kir ku hevserokên berê yên Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Selahadîn Demîrtaş û Fîgen Yuksekdag serbest berde.

Ev yekem daxwaza dadgehê ye piştî hilbijartinên vê dawiyê yên serokomariya Tirkiyê ku Serokomar Recep Erdogan têde bi ser ketî.

Roja Sêşemê 6/6/2023, dadgehê daxwaza xwe ragihand û got ku Tirkiye bi israra li ser girtina van serkirdeyan, xalên (4-5) yên peymana mafên mirovan li Ewropayê binpê dike.

# Perwerde û Hînkirin

**Nûşîn Bêcirmanî**



***Perwerde Jiyan e... (Dêwê )***

Di kultûrê Kurdî de hatiye gotin (Nîv melayan dîn biderdan, û nîv textoran can bider dan), ez jî vê gotina pêwîst û bi wate temam dikim û dibêjim, nîvmamosteyan jî jiyan bider dan....!).

Ji ber giringî û pêwîstiya perwede û hînkirinê, gelek nivîs, lêkulîn û pirtûk li ser hatine amadekirin, çiku perwedeyê ji destpêka peydabûna merov li ser rûyê zemînê, destpê kiriye, ji zanyariyên herî kevin e, ku mirov di vî beşê zanînê de xebitiye û lêkolîn çêkirine. Ji vê jî zanyarên perwerdeyê ên ku danasîn dane, wê bi gelek awan perwerde destnîşan kirine.

Di hînkirinê de, gelek hêman hene ku roleke wanî berz û gewre heye, ew jî ziman , mamoste û rêvebiriya perwedeyê ne. Pêwîst e rola hêmanên din jî yên hînkirinê , neyên paşguhkirin. Bê guman di vî bêşî de ezê li ser wan binivîsim.

**1 - Ziman :**

Ziman, sîstemeke peywendiyê ye, ji komek deng û simbolên nivîskî, yên ku nişteciyên welat, dever an yê gelekî bikar tînin . Ziman di jiyana tevaya civakan de bi roleke mezin radibe, ziman alava derbirîn û peywendiyê ye. Û di pêvajoya hînkirinê de, ji ber ew alavê têkildariyê yê sereke di navbera şagirt û mamosteyan de û di navbera şagirtan bi xwe de ye jî, ziman hêmanê herî girîng e.

Cureyên zimanan geklek in, li gor bikaranînê an li gor xwezaya zimanan têne dabeşkirin , lê giringtirîn ziman, zimanê Dayikê ye, ew zimanê ku zarok di destpêka jidayikbûna wî de, bihîstiye, di malbatê de tê bikranîn; zanyarên hînkirin û perwerdeyê pêwîstiya hînkirinê bi zimanê dayik pileyeke bilind didine vê xalê.

Di hînkirin û perwerdeyê de, Zimanê dayikê, pêdiviyeke pêwîst e, ew nasnameya civakî , kesayetî û ya çandî li cem zarok ava dike.

Ji bo giringiya zimanê dayik di hînkirinê de, ez vê DATABASA UNESCO ya li ser newekheviya perwerdeyê nîşan dide, tînim ziman, ( zarokên ku bi zimanê pê li malê dipeyivin (Ango zimanê dayikê) têne fêrkirin, 30% zêdetir gumana ku di dawiya dibistana seretayî de fêrî têgihiştina xwendinê bibin li beramberî zarokên ku li seranserî cîhanê bi zimanê malê (zimanê Dayikê) fêr nabin.

Ev Databasa Unesco ji me re diyar dike ku, fêrkirin dema bi zimanê dayikê be, wê berhemê fêrkirin û perwerdeyê bihtir û li pêştir be .

**2 - Mamoste:**

ev mirov kî ye? Çi dike? Çi gotin hevkûfê wî ne?..... Bi rastî gelek danasîn ji bêjeya (mamoste) re hatine danîn û çî baş dermafê wî were nivîsandin jî, dê kêm be, li hember westan û rola wî di ber fêrkirin û perwedeyê de.

- Mamoste komek ji serpêhatiyên ku bi dest xistine arasteyî şagirtan dike, bi rê û alavin hêsankirî tê kirin ta ku şagirt bi hêsanî vê yekê biprjirîne, ji ber vê yekê, mamoste KEVIRÊ bingehîne di pêvajoya hînkirinê de. Ew rêberê civakê ye , nifşên nû ji paşerojê re amade dike .

- Gelek rê li pêşiya mamoste hene ku bandorê bi rengekî xuya li jiyana şagirtan bike , weke :

A - Mamoste, zanyarî û her tiştê pêdivî ji serkeftinê re di jiyanê de, vediguhêzê ji şagirtan re, wan bi rengekî erênî û çalak hîn dike bo pêşerojeke baştir.

B – Mamoste ji şagirt re nimûnekî herî pîroz e, bo wilo mamosteyê erênî, ew yê herî xwedî bandor e li jiyan, kar û şêweyên şagirt di jiyanê de.

C – Bandora mamoste li civakê bi xwe jî heye, dîrok û şaristaniya xwe diparêz e... Mamoste, tuştê buhirî diparêze, yê niho pêşdixê û paşerojê çêdike.

**3 – Rêvebiriya Hînkirinê:**

Rêvebirî di her rêxistin an saziyekê de, mîna birca çavdêriyê ya li balefirgehan e ku bêyî wê rêwerz winda dibe û şansên daketinê zêde dibin.

Di milê perwedeyê de gelek rêvebirî hene, rêvebiriya dibistanê, rêvebiriya perwerdeyî li herêmê û rêvebiriya perwerdeyî li welêt.

di vê gotarê de, ez dê li ser rêvebiya dibistana rawestim ji ber giringiya wê di karê hînkirin û perwerdeyê de. Bê guman, rêvebiriya dibistanê ya serketî, yek ji stûnên sereke yên her civakekê dimîne, çiku , şagirtên derçûyî bo pêşketina civakê peyda dike.

- Lêkolînên pêşîn li ser rêvebiriya dibistanê, bal dikşande ser rêvebirê dibistanê bi tenê, ji hêla kesayetiya wî, peywir û şêwazên rêvebirina wî ji dibistanê re. Lê belê, lêkolînên vê dawiyê, ji salên notan ji sedsala bîstan vê destpê kirine, ber bi lêkolîna li ser rêvebiya dibistanan bi xwe , ne li ser rêvebirê wê û diyarkirina pêdivî, merc û astengiyên li pêşya wê derdikevin.

Gelek taybetmendiyên rêvebiriya serkeftî hene ku dibin pîvanên nirxandina wê, ji wan :

..... 9

# Ziman Û Netew

**Nehrî Goranî**

Danasîn: Cureyên rêz ji nîşandek û sembolan tev alavek ji alavên zanistiyê ne.

Ziman di têgeh û danûstandinê de, û di nav kesên çivakê û hemî warên jiyanê de, emraza herî giring e. Bêyî zimên çalakiyên mirov ên zanistî zor in. Ziman bi ramana mirov ve girêdayî ye, ramanên mirov bi rêya zimên zelal û aşikere dibin, ta di jiyana wî yî hundirî de jî.

Ziman rengvedana dengên siruştê ye, bingeha hemî zimanan bi têkilî û karên hevbeş ên bi derdora xwe ve girêdayî ye. Mîna dengê bê, bahoz, xuşxuşa solîvan, çîvçîva çûkan, hîrhîra hespan ev deng li ba her miletekî nav lê bû, nivisandin jî li gorî têkiliyê derdora xwe û tîpên xwe hilbijatin, wek tê xuyakirin dibêjin: Zimanê Somerî di devera Mîzoptemiye de, berî pir zimanan hatiye bikaranîn, miletên din jî li gor pêşketina xwe ziman bi dest xwe xistine û bipêşxistine; gava ziman li pêş be, ew nîşana pêşketina wî miletî ye, ziman neynik e. Bikaranîna alavên nûjen rolek mezin dilîze.

Du ziman di cîhanê de pê tê peyvandin. Yek zimanê Çînî nêzîkî 1,9 miliyar kes pê daxêvin û dinvisînine. Ê diduyê yê zimanê Însglîzî, ji ber ku hêsan e û bûye zimanê zanistê û aboriyê.

Zimanê Kurdî yek ji zimanên Hindo-Ewropî ye; ji aliyê peyvan de gelekî dewlemend e, ne kêmtirî zimanên derdora xwe ye, bêjeyên zimanê Kurdî derbas nav ên dora xwe bûne, gelek peyvên wî jî ji xwe re bikartînin.

Lê mixabin neyarên zimanê me bi hemî hêzên xwe li dijî ziman û kultûra wî kar dikin ku wî winda bikin û vê re netewa Kurdî jî dêris bikin. Lê tevî vê tûjî û zorê, zimanê Kurdî kanîbû xwe biparêze. Rol û cefayê hemî hozan û rewşenbîrên wî xebatek bê hempa kirine û dikin ta roja îro nifşek nuh derketiye û bi rolek mezin radibin. Divê bi vî zimanê pîroz were xwendin, nivîsandin … Yanê di hemî berghên jiyanê de kar pê were kirin ta ku bi pêşkeve.

Zimanê Kurdî ta demekê devkî bû, ne niviskî bû; tevî wê kanîbû berdewam bikira lê niha bûye zimanekî berhemdar.

Serpêhatiyên hin netewan di paristina zimanên xwe de.

1- Capan: Tevî deriyê xwe li pêş zimanên welatên Rojava vekir jî, lê zimanê xwe yê netewî parast û di hemî waran de bikar anî, komîtek wergerandinê avakir û hemî beşên zanistê wergerandin zimanê xwe.

2-Çîn: Li destpêkê Zimanê Înglîzî bikar tanîn. Lê piştî şoreşa çandî bi rêberiya Mewtsî Tong zimanê çînî bû zimanê ferimî .

3- Korya: Di sala 1946an de, zimanê caponî yê sereke bû û bikartînan, rêberên Koriya biryar standin ku divê zimanê korî di çalakî û xwendinê de, bête bikaranîn; û di demek nêzîk de ew bû zimanê zanistê.

## Hevalê Bengîn Mihemed (Bavê Şahîn) xatirê dawî xwest



P.Y.D.K.S
Hevalê nemir
Bangin Eli Mihemed
2023 - 1967

**Li Hewlêra paytext, piştî berxwedaneke domdirêj bi nexweşiya penceşêrê re, roja Înê 26.05.2023-yan,heval Bengîn koça dawî kir û termê wî bal Qamişlo ve hate veguhestin, û bi beşdariya birek dost bi xakê hate spartin.**

**Hevalê Bengîn, temenê xwe ji bo kar û xebata kurdewarî terxan kiribû, hezkirin û rêzgirtina xwe di dilê heval û dostan de bicih kiribû. Herwiha, Bavê Şahîn bi dilsozî û bînferehiya xwe di nav hevalên xwe de dihate naskirin.**

**Li roja Înê. 26.05.2023-yan, bi ahengekê, li Hewlêrê rêwresma çilrojiya wî hate lidarxistin, gelek gotin hatin xwendin, ji wan: Gotina Nûnerê Partiya me li Hewlêrê, gotina Rêxistinê û ya ciwanan û dost û hevalên wî û hin gotarên din û birûskên sersaxiyê hatin xwendin.**

**Bila cihê heval Bengîn bihuşt be, serê malbat, dost û hevalan sax be!**

**Perwerde... Dûmahîk**

1 – pabendiya rêvebiriya dibistanê bi yasayên perwerdeyî yên ku di desteya perwerdeyê û rêvebiriyên bi ser ve girêdayî de, bikar tên.

2 – peydakirina giyanê hevkarî û beşdariyê, nerîn û standina biryaran ne bi xwe tenê ve girêbide.

3 – guhdan li zanyariyên nû di karûbarên perwerde û hînkirinê de.

4 – nûjenkirina peywendiyan bi civakê re.

5 – Alîkarî bi mamosteyan re bo bi karê xwe rabin, weke dadmendiyê di navbera wan de û rawestana li ser pirsgirêkên wan.

6 – Şêweyên nûjen û pêşketî ji xwe re bikin armanc.

Di jiyana mirovan de, Perwede û hînkirin ji zanyariyên herî kevnar in, bi gotarekê têr nabe, ev hewcedarî berdewamiya lêkolîn û nivîsan e; bo wilo berdewamî di vê mijara perwerde û hînkirinê de, dê hebe, û di jimarên weşana NEWROZ de bêne belavkirin.

# DANASÎNA ZİMANÊ KURDÎ

**Wergerandina ji Erebî: Memê Alan**

Di serî de, ez beşdarbûna we sipas dikim... Herweha spasî ji her kesê ku ev pêşxeriya niştîmanî ya pîroz pêk aniye re, bi hêviya ku ev pêngav bibe destpêk ji pêngavine din en erênîtir re û bikeve xizmeta çanda jiyankirina hevbeş di welatê me Sûriyê yê delal de. Herweha jî ji min re rûmet û serbilindî ye ku îro ez li vê cîgeha zanistî û şaristanî, û li pêş van kesayetiyên niştîmanî û zanistî yên welatê xwe bisekinim da ku wan bi zimanekî niştîmanî yî resen bidim naskirin, ew jî Zimanê Kurdî ye - zimanê çiya û kewan; û ji ber tengbûna derfeta demê, ezê waneya xwe pêşkêş bikim bê ku ez têkevim hûrgiliyan.

**= Danasîna zimên:**

Di karnava berçavbirina pêvajoya pêşveçûna dîrokî ya giropên ademîzadiyê û hemî şêweyên mîna nîşan û wêne... û HWD ên ku ji bo guhestina bîr û boçûnan, zanyariyan û hestan - çi di nav endamên her giropeke ademîzadiyê ye ku di herêmeke erdnîgarî de dijîn, an jî bi giropên ademîzadiyê yên din re - hatine bikaranîn, ziman dimîne şêweya herî pêşketî.

**= Parvekirinên Zimanî:**

Ta vê kêlîkê tu hejmar bêlî û zelal ji zimanan re di cîhanê de tune ye, lê hejmara derdorî ya ku Rêkxirawa «Yûnisko» ya girêdayî Neteweyên Yekgirtî belav kiriye, dora/7/ hezar ziman e, û gelek nêrînên cuda li ser zimanên ji hev ve nêzîk (yanê ji yek jêderê) hene, lê ya herî berz û ji rastiyê ve nêzîk ya lêgervanê zimanî yê Almanî «Fridrich Max Muller/Firêdrîk Maks Mûler» e (ya ku zimanên cîhanê parve ser sê giropan kiriye), û ew jî ev in:

**1- Giropa Hindo-Ewropî:** Mîna Zimanên Îranî yên kevin û Zimanên Enkilo - Ewropî û Zimanê Hindî...H.W.D.

**2- Giropa Samî - Hamî:** Mîna Zimanên Erebî û Ibrî.

**3- Giropa Toranî:** Mîna Zimanên Turkî, Mengolî...H.W.D.

Her giropek ji wan giropên zimanî malbat û êlên zimanî, yên ji hev ve nêzîk, di hundir xwe de dicivîne, weke malbata Zimanên Îranî yên kevin (ya ku jê zimanên Farisî û Kurdî... H.W.D vedikşên).

Ziman weke her jîndarekî dijî, pêş dikeve, tê guhertin, li ortê hev dikevin, hikariyê bi hev dikin û ji hev dibin, hin caran bi hev re dikevin nakokiyan û ji bo mandinê rikberiyê jî dikin, û hin caran jî li ser hesabê hev fere dibin, lê vir ne ciyê hewaldana sedemên wê ye. Hin jê bi çerx û demê û zanişweriyê re dimeşin, û hin jî di nav xwe tenê de dimînin û qir dibin. Her zimanek ji yên bilî xwe, bi radeya şaristaniya xwe û dûrbûna ji koka xwe, tê cudakirin, herweha her zimanek bi taybetiyên xwe ji zimanên din cîwaz dibe, ta zimanên ji yek girop û malbatê jî (yên ku bi hev re hin taybetiyan parve dikin).

**= Zimanê Kurdî:**

Ew zimanekî netewî yî dora pêncî milyon Kurd e, zimanê Pirtûka Zeredeştî ya pîroz «Avêsta» ye, zarzimanê Pirtûkên Ezdahî yên Kurdî (Nimêj/Selewat, dirûşim, gotin/qewil, sirûd û helbestên olî... H.W.D), û ji giropa Zimanên Hindo - Ewropî û ji malbata Zimanên Îranî yên kevin - beşê Rojava ye. Zimanê Kurdî li gor mercên dîrokî yên tê re derbas bûye jî mîna zimanên din pêşket û fere bû, û hin caran hat hev jî, û ew ji zimanên ku nikanîbûn bi pêşveçûn û pêşketina ku li cîhanê çêbûye re bimeşiya, ji ber sedemên naskirî ku niha vir ne cihê ku em wan bi bîr bînin.

**= Koka Zimanê Kurdî û Zaravên wî yên sereke û Alfabeyên/Abeyên wê wî yên niha bi kar tên:**

**- Koka Zimanê Kurdî:**

Li gor hejmarek ji lêgervan û dîrokzanên zimanî û li ser bingeha hin hejmarokên ku li cîgehên kevneşopî yên Erdnîgariya Kudistanê diyar bûne, koka Zimanê Kurdî vedigere /5000/sal berî zayînê.

**- Zaravên serekîn:**

**1- Kurdiya Jorîn an a Bakurî (Kurmancî yan Behdînanî):**

Dora 75% ji Kurdan (Tirkiyê, Sûriyê, Kurdên Ermîniya, Kurdên Ezerbeycanê, Kurdên Xoresanê li Îranê, Kurdên Libnanê û gelek Kurdên li seranserî cîhanê rûdinin) pê daxivin.

**2- Kurdiya Jêrin an a navîn (Soranî):**

Kurdên «Silêmaniyê, Kerkûkê» û hin ên Hewlêrê li Herêma Kurdistanê, û Kurdên Başûrê «Gola Ormiyê» li Îranê pê daxivin.

**3- Kurdiya Başûrî (Hewremanî):**

Kurdên Herêma «Mêrîwan» li Îranê û Kurdên «Helebçe û Xormalê» li Herêma Kurdistanê pê daxivin.

**4- Kurdiya Zazakî:**

Kurdên (Dêrsimê, Palo, Gênco, Siwêrekê, Bêcar û Colemergê) li Turkiyê pê daxivin.

**- Alfebeyên wê:**

Di karnava dîrokê de, zimanê Kurdî bi çend alfebeyan hate nivîsandin mîna (Mîxî/Mismarî, Avêstî, Aramî, Masî, Sotî û Behlewî), lê niha jî bi du alfebeyan tê nivîsandin û ew jî ev in:

**1- Alfebeya Latînî:**

Bikaranîna wê pirtir e, yanê dora 70% û li hemî cihên ku Kurdiya Kurmancî bikar tînin (Turkiyê, Sûriyê, Kurdên Libnanê, Ewropa, Ermîniya û Ezerbeycanê, û rêjeyek ji Kurdên Îraqê û Îranê jî). Ew ji /31/tîpan pêk tê, û zimanzanê gewre «Mîr Celadet Alî Bedira-Xan» di salên 30an ji sedsala borî de, li Şamê bingehên wê danîn, û wî ew bi rêdanekê/terxis ji Şalyariya Hundirîn a Sûriyê (ya wê hîngê) li sala 1932-yan Z di belavkirina Kovara «Hawarê» de .....

11

**Danasîna... Dûmahîk**

bikar anî. Herweha jî, wî bingehên Rêzimana Zimanê Kurdî danî û di wê Kovarê de - wê hîngê - belav kirin.

**2- Alfebeya Erebî:**

Ji /38/ tîpan pêk tê û li Herêma Kurdistana Îraqê bikar tê, û herweha jî Kurdên Îranê bikar tînin.

**= Hin agahiyên din li ser Zimanê Kurdî:**

**-** Li gor hejmara axêveran, Zimanê Kurdî li cîhanê radeya /59/an werdigre.

**-** (735320) bêjeyên sereke di xwe de kom dike û weha jî (1200000) şor di hemî zaravên xwe de, û li gor hejmara bêjeyan -piştî herdu zimanên Filendî û Korî- ew radeya sisiyê distîne.

**= Taybetmendiyên bingehîn ên Zimanê Kurdî:**

- Ew zimanekî kîteyî ye û ne ezberî ye, kît li gor zanistiya dengan perçak ji bêjeyê ye û yekcar ji dêv derdikeve.

- Ew zimanekî lezqok e, yanê bi zêdekirina pêşkîtekê yan paşkîtekê li ser koka bêjeyê bêjeyeke nû bi wateyeke nû tê darajtin/çêkirin.

- Li gorî lêvkirinê tê nivîsandin.

- Hejmara tîpan qaserî hejmara dengan e, yanê beramberî her dengekî tîpek heye, ev jî tê wateya ku di Zimanê Kurdî de /31/dengên sereke hene û li hemberê jî /31/tîp hene; Ji bilî awerteyek tenê em niha ne di sebaretî bîranîna wê de ne.

- Taybetiyên me li jor anîne zimên, taybetiya hêsanbûna fêrbûn û hînbûnê didiyê.

**= Sûriyê û Zimanê Kurdî:**

Kurd li Sûriyê Kurdiya Kurmanî ya Bakurî û Alfebeya Latînî li hemî cihên hebûna wan (li herêmên Kurdî wek(Efrînê, Kobaniyê - Eynerebê, Serê Kaniyê - Re›is El›eyn, Dirbêsiyê, Amûdê, Qamişlê, Dêrîkê, Hesekê) û herweha hin ji Bajarên Sûriyê yên mezin wek (Heleb, Şamê, Reqê...H.W.D) bi kar tînin.

Girîngiya pirjimarî û cûretiya zimanan li welatê me Sûriyê (Zimanê Erebî, Kurdî, Ermenî, Suryanî, Aşûrî) ji welat û gelê me re zengînbûn û sermiyan e û ne jarbûn û lawazbûn e, ji ber ku cûrerengiya zimanan yanê cûrerengiya çandan e, cûrerengiya çandan jî ji bo çi welatî be tê wateya cûrerengiya afrandin û pisporayetiyê di hemî waran de, û ev jî derfetên pirtir dide pêşketina wî welatî zêdetirî welatê yekziman û yekçand û yekreng...Ma gelo, gulîstaneke yekcûre gul û çîçek û darên yekreng û bîn û durv, û gulîstaneke din e cûrercûr gul û çîçek û darên tonbiton reng û bîn û berhem mîna hev dibin.

**= Berhemdanên Zimanê Kurdî:**

Zimanê Kurdî tê peyvandin û nivîsandin û xwendin, ne mîna ku tê gotin ku ew tenê zimanekî devkî ye, û vaye li jêr jî kurtasiyek wek nimûne li ser berhemdanên wê ne:

- Bi dehezaran helbest û sirûdên li ser têvel aliyên jiyanê, ji aliyê bi sedan helbestan ve û li ser serê hemiyan mîrê Helbestvanên Kurd «Ehmedê Xanî» û «Meleyê Cezîrî, Feqê Teyran, Cegerxwîn, Şêrgo Bêkes, Hacî Qadêr Koyî, Hejar Mûkiryanî, Seydayê Tîrêj... H.W.D».

- Bi sedan çîrok û romanên mîna (Çiyayê Bi Xwînê Hatiye Avdan, Bîra Qederê, Kela Dumdimê ya Nivîskar Erebê Şemo yê ku şana dostaniya gelan ji Yekîtiya Sovyêtistanê wergirtiye), û Çîroka «Pêxemberê me Yûsif û Zelîxe» ya helbestvanê nemir «Selîm Silêman»...H.W.D.

- Hejmarek ji dastan û efsaneyên dirêj ên ku kêm weke wan di zimanên din de hene, mîna Dastana (Mem û Zîn, Xec û Siyamend, Delal û Edûl, Ferhad û Şêrîn, Zembîlfiroş, Kela Dimdimê)...û H.W.D.

- Bi hezaran ji pirtûkên wêjeyî û çandî û civakî yên mîna pirtûkên (Şerfname - ya Mîr «Şerefxan Betlîsî/1543 -1603.Z/», Mewlûdname - ya Helbestvan»Mile Hisênê Batê/1675-1760.Z»), û herweha jî bi sedan kovar û rojname û belavokên ku hemî aliyên jiyanê şirove dikin, jê: Rojnameya Kurdî ya yekem «Kurdistan» a ku Mîr «Miqdad Midhet Bedirxan» li «Qahîrê» li 22.4.1898an. Z derxistiye, û Kovarên (Hawarê, Gulîstanê, Gelawêjê...û H.W.D).

Careke din sipas ji beşdarbûn û guhdariya we re.

**#- Têbîn:** Ev Wane bi Zimanê Erebî ji aliyê Endezyar «Qaziqlî Mihemed» ve hatibû pêşkêşkirin, li Kolîja Wêjeyê - Zanîngeha Heleb, li sala 2021an. Z.

---

**Nivîskar... Dûmahîk**

*we hemiyan sax be.*

**Birayê we**
**Muhyedîn Şêx Aalî**
**Sekreterê Partiya yekîtî ya demokrat a kurd li Sûriyê**
19.07.2023an

**Hêjayî gotinê ye ku 8 berhemên mamoste Mehmûd çap û belv bûne, ew jî ev in:**

1- Nîgarên kul û derdên jiyanê-Helbest-sala 1996.

2- Nerînek di terazûya ristên Kurdî de- sala 1997.

3- Geştek li nav baxê ristên «Cizîrî»-Beşê yekem- sala 2000.

4- Hin hest û ramanên netewî û civakî- sala 2002.

5- Geştek li nav baxê ristên «Cizîrî»-Beşê duwem- sala 2003.

6- Doza giran û umîdên xwezga yên tevlihev-Helbest-Beşê yekem- ala 2006.

7- Doza giran û umîdên xwezga yên tevlihev-Helbest-Beşê yekem- ala 2007.

8- Cengên xaçparêzî û şikodariya berevaniya Kurdî-Vekolîn-sala- 2013.

---------

* Jêdera kurte jiyanê: Rojnama Newroz- hejimar /153/-06 Rezber 2022 an

# Pakrewan Qasimlo û hevalên wî ji bîr nabin ...
# Doza wan jî winda nabe !


1930-1989

Roja 13ê Tîrmeha sala 1989-an, ango berî 34 salan, di dema ku Pakrewanê Kurd ê navdar Dr.Ebdurehman Qasimlo/ Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û hin hevalên din ên serokatiya partiyê, bi armanca berdewamkirina guftûgoyeke du alî ji bo çareserkirina pirsa Kurd li Kurdistana Îranê bi şêweyekî aştiyane, li malekê ji malên paytexta dewleta Nemsayê (Viyêna), ji bal berpirsên Komara Islamî ya Îranê ve bi xinizî hatin Kuştin.

Ebdurehman Qasimlo, sala 1962-an, ji Zanîmgeha Bragê, dektora di Abornasiyê de wergirtiye, Paşê, pirtûka xwe ya bi navê Kurd û Kurdistan weşandiye.

Eve 34 sal di ser terorkirina wî û hevalîn wî re derbas bûne, hê jî Kujerên wan berdayî ne, hawîr kuştin û mrinê belav dikin! Pakrewanên azadiyê, Dr. Qasimlo û hevalên xwe zindî ne. Ew namirin!

## Nivîskar û helbestvanê Kurd Mehmûdê Sebrî koça dawî kir

Nemir Mehmûdê Hecî Sebrî Kurte jiyana weha nivîsand:

Navê min, Mehmûdê Sebrî ye, Sala 1937an, li gundê MELEK, nêzîkî Derbêsiyê, Parêzgeha Hesîça ji dayik bûme, di 13 saliya xwe de, li ser destê şêx û feqeyan, dest bi xwendina olî kiriye, û ji ber ku min li ser şewata sînemeya Amûdê nivîsandiye, ji dibistana olî hatime bidûrxistin. Di salên 1960î de, bi alîkariya Hemze Niwêran û Hemîd Derwîş, ku wan pirtûk ji min re peyda kirin, min bawernameya pola 9ê sitand û ji ber ku ez hevalê Partî bûm, rijêmê ez weke mamoste qebûl nekirim, rabû min berê xwe da bajarê Dêra Zorê û li wir 6 salan karê mamostetiyê kir. Di wan 6 salan de, min



bekelorya stand, herwiha min bawernameya (Dar muelimîn) jî wergirt, û ji ber ku li wî bajarî kesî haj kêşeya Kurdî tune bû, min xebata xwe ji bo zimanê Kurdî pêşxist, paşê, ez vegeriyam Hesîçe û li wir min karê mamostetiyê kir, û digel rewşa min a aborî ya dijwar, min dest bi xwendina zanîngehê, beşê Yasa û Mafnasiyê kir û jê derçûm.

Li destpêkê, hêjayî gotinê ye ku digel hebûna cudahiyê di navbera zimanê axaftinê (zimanê devokî) û zimanê nivîsandinê de, ango zimanê Kurdî yê petî de heye jî, lê, em ji bîr nakin ku zimanê me Kurdî ye. Ez Kurd im, zimanê min Kurdî ye.

Ji bilî vê yekê, min 10 salan bi zimanê Erebî xwendiye û li ber destê şêx û meleyan fêrî feqetiyê jî bûme, lewra, ji wê demê ve min helbestên tesewifê mîna yên Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî … û hwd dixwendin, vê yekê hişt ku heskirina zimên di dilê min de mezin bibe. Herwiha ji ber ku min feqetî kiriye, ez li deverên Herêma Cizîrê geriya me û zaravayên wan nas kirine. Ji ber van sedeman, min ji zimanê dayikê hez kiriye û dest bi xebatê ji bo vejîn û geşkirina wî kiriye, hewl daye ku wî pêşve bibim.

Lê, mixabin! nivîskarê giran buha li bajarê Heseskê êvara roja Sêşemê 18.07.2023an koça dawî kir, ciyê xemgîniya xelkê kurd bû, û ev jî birûska Şêx Aalî ye:

### Sersaxî

*Nûçeya koçbarkirina dawî ya mamoste Mehmûdê Hecî Sebrî*

*li bajarê Hesekê ciyê dilêş û xemgîniyê bû.*

*Ew li dirêjahiya bêtirî 50 salî, bi dil û can, bi dilsoziyeke bê sînor, di ber zimanê kurdî de xebitî bû, û di weşana kovara XUNAVê de li hundir Sûriyê, di rewşên dijwar de, xwediyê roleke sereke bû.*

*Bila kur û keç, meriv û dilxwazên Mehmûd Sebrî xweş bin, serê* .....

11